



K.T.

Zanîngeha Mardin Artûklûyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez

DI DENG BÊJÎYÊ DE MÎNAKA DENG BÊJ ŞAKIRO

ABDURREZZAK DAĞ

22721007

Şêwirmend

Dr. Şehmus KURT

Mêrdîn 2023

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisans Üstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Di Dengbêjyê De Mînaka Dengbêj Şakiro” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kâğıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylıyorum.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinde erişime açılabilir.
- Tezimin/Projeminyıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

29.08.2023

Abdurrezzak DAĞ

KABUL VE ONAY

Abdurrezzak DAĞ tarafından hazırlanan ‘Di Dengbêjîyê De Mînaka Dengbêj Şakiro ‘adındaki çalışma, Savunma Sınavı Tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı, TEZSİZ YÜKSEK LİSANS PROJESİ olarak oy birliği/oy çokluğu ile kabul edilmiştir.

.....
.....

.....
.....

.....
.....

NAVEROK

KURTE	iv
ÖZET.....	v
PÊŞGOTIN	vi
DESTPÊK	1
1. Armanc û Mijar:	2
2. Rê û Rêbaz	2
3. Girîngî:	2
4. Sînor û Astengî:	2
BEŞA YEKEM	4
PÊNESEYA KEVNEŞOPÎYA DENG BÊJÎYÊ	4
1.1. Pênaseya Dengbêjîyê:	4
1.2. Pênaseya Kilaman	4
BEŞA DUYEM.....	6
CÛREYÊN EDEBÎYATA DENG BÊJÎYÊ.....	6
2.1. Edebiyata Gel a Anonîm	6
2.2. Edebiyata Gel a Dengbêjan	6
2.3. Edebiyata Gel a Medrese û Tekiyayan	6
2.4. Taybetîyên Kilamên Dengbêjan.....	6
2.4.1. Taybetîyên Teşeyî yên Kilaman	6
2.4.2. Taybetîyên Naverokî yên kilaman	7
2.4.3 Têkilîyen kilaman bi Cûreyên Edebî re	7
BEŞA SÊYEM.....	13
3.1. Jînenîgariya Şakiro	13
3.2. Jîyana Hûnerî ya Şakiro	14
ENCAM	19
ÇAVKANÎ	20
WÊNE	21

KURTE

Ev xebat li ser Dengbêjîyê û jiyana hunerî ya hunermendê kurd Dengbêj Şakiro ye. Jiyan û huner bi derdorê re watedar dibe. Bêyî wan û famkirina derdorê ew jiyan û huner jî bêwate dibe. Ji ber vê yekê di beşa yekem de kurtenêrînek li ser wateya Dengbêjîyê û çandî hatiye kirin. Di beşa duyem de li ser têkîliya Dengbêjîyê û edebiyat, çîrok, destan, lorî. bi berfirehî hatiye rawestîn. Di beşa sêyem de behsa jiyana wî ya hunerî û di muzika kurdî de cihê Dengbêj Şakiro tê vegotin. Di dawîya vê xebatê de jî encama vê xebata hatiye gotin. Di xebatê de li ser kilamên Dengbêj û naveroka wan bi berfirehî nehatiye sekinandin. Tenê minaka dengbêjan de behsa wî hatiye kirin. Ev xebat 30 rupel e.

Bêjeyên Sereke: Dengbêj Şakiro, Kurd, Kilam, Edebiyata Kurdî.

ÖZET

Bu çalışma Sesin Tanımı ve Kürt sanatçı Dengbêj Şakiro'nun sanat hayatını kısaca konu almaktadır. Yaşam ve sanat çevre ile anlam kazanır. Onlar ve çevre anlayışı olmadan yaşam ve sanat anlamsızlaşır. Bu nedenle birinci bölümde Ses ve kültürün anlamı hakkında kısa bir değerlendirme yapılmıştır. İkinci bölümde Ses ile edebiyat ilişkisi, hikâyeler, el kitapları, şarkılar vb. yaygın olarak durdurulmuştur. Üçüncü bölümde, sanatçının sanat hayatı ve Dengbêj Şakiro'nun Kürt müziği içindeki yeri anlatılmaktadır. Bu çalışmanın sonunda ise bu çalışmanın sonucundan bahsedilmektedir. Eserde Dengbêj'in güfteleri ve içerikleri ayrıntılı olarak ele alınmamıştır. Sadece şarkıcılar örneğinde bahsedilmiştir. Bu çalışma 30 sayfadır.

Anahtar sözcükler: Dengbêj Şakiro, Kurd, Kilam, Edebiyata Kurdî.

PÊŞGOTIN

Di vê xebatê de kurtenêrînek li rewşa herema Dengbejan û jînenigariya wan, mînaka hunermendê Dengbêj Şakiro bi berfirehî hatiye kirin. Xebatên derbarê dengbêjiya kurdî û bi taybetî jî derbarê kilambêjên kurdan de gelek in û pêwist e ku derbarê van kesan de lêkolîn bîn kirin. Li gorî lêkolîna ku hatiye kirin bi taybetî di derbarê wan de nivîsên kovaran û malperan, gelek tez, pirtûk û sempozyûm berfirehî hatiye amedekirin.

Li herema Serhedê dengbêj û dengbejî gelek giring e. Em karin bêjin ne tenê di warê serhedê da her wiha li her çar perçê Kurdistan de giring bû. Di sinet û dawetan de def û dawet tîn kirin û danîn tê anîn. Di van pîrozbahiyên de herî kêm sê roj û sê şev stran hatin gotin. Mirov bi van dangan kelecane dibûn. Ji bo kêfê û bikeve bextewariyê.

Herema Serhedê, ji aliyê dewlemendiya dengbêjan giring e. Ji ber vê yekê ji sînora stranbêjên pir navdar derketin. Li qesrên birêzan, li gundan û civatan de deng dihatin bihîstin. Li dora mîran dengbêj bû. Di nav civakê de yê dengbêj bi hev ra deng didan hevdu.

Stranbêj Bedihe Kor, Evdilmecîd ji dîwana Begê Sipkî bi awayekî din qêriya. Şêroyê Biro ji aliyê karakter, şewaz û awazê ve li pey Evdal bû. Filitê Qûto ji li Axtepeyê ji taxa Sîpan a Xelatê pey wan bû. Resoyê Dengbej wek Şahê Dengbêjan dihat nasîn û bixwe jî mamosteyê Şakiro bû. Tahiro, Zahiro, Hiseyno, Sidiqo, Hecî Evdilkerîm û hwd mîna van dangan, her yek dibistanek e ji van dengbêj û dengên sînora in.

Her yek pirek e, pirek e di navbera nîşê kevin û nû de sînora e. Ew stûnên çand û hunera kurdî ne, lêkolîner in, çîrokbêj in, dîroknas in... Dengbêj Şakiro ali navendê, yanî qêrîn, ji aliyê sed hezaran kesî ve hat temaşekirin. bi serketî ji qadê derket. Kesên Serhedê "Kewê Ribat" û bi navê "Şahê Dengbejaan" hatiye binavkirin û xelatkirin. Navê Dengbêj Şakiro ji serhedê digere hemû welat û cîhanê. Nav û deng da hemû sînora, heta kurdên belavbûyî. Bi sedan dengbêjên navdar ji sînora derketin. Deng ji odeyê ode, mal bi mal, gund bi gund, bajar bi bajar belavbûn. Bi vî awayî çand û toreya

kurdan, urf û edetên wan pêkanîn. Bê guman ya herî navdar "Kewe Ribat e" "Şahê Dengbejan" Dengbej Şakir e.

Kilamek ji bo guhdarîkirinê amûrek muzîkê hewce ye. Dengbêj bi dengê xwe vê kêmasiyê nîşan nadin. Mirov di wê de xwe dibîne. Carinan evîna yekem tîne bîra meriv, ew bê îrade hêstiran li ser rûyê xwe dibarîne. Carinan dîrokek yê ku dibêje bûyerek jixwe bi destê mirov diqewime, bi tamamî tê şopandin. Carinan bi serbilindî ji jiyana lehengên kurd behs dike. Carinan kurdek xemgîn û evîndar Dengê keça wê ye. Carinan dengê dayikeke dilşikestî ye. Cotkaran bi stranên wan tov diçandin.

DESTPÊK

Di dirokê de gelê Kurd, rastî çandên gelek neteweyên cihêrengî hatiye ku wan qesda welatê Kurdan kiriye. Bivê nevê wan jî bandor li çand û jiyana wan kiriye, lê neteweyên dinyayê, ji çanda Kurdan û teherê jiyana wan, hin tişt girtine. Em ji reng û rûyê berhemên gelêrî derdixînin ku huner, raman û bi van ve girêdayî helbesta devkî ya Kurdî, di dirêjahiya qernan de, teşe girtiye, şewaz guhertiye û gihîştîye merheleya îro.

Beşeke mezin a heyîna çanda gelan, ji bilî zimên, ahengiya hest û ramanê ye ku bi berhemên menzûm teşe girtiye. Jixwe ji ber ku di jiyana Kurdan de, bi taybetî li bakurê welêt, di Kurmancî de, ji zimanê nivîsê zêdetir, zimanê edebiyata devkî derketiye pêş. Bi vî awayî, hunera ahengiya zimên, bi devkî gurr û geş bûye. Heta dema serdestiya medeniyet û şaristaniya Îslamê, ev awa bi pêş ve çûye. Di heyama canda Îslamê de ev beşa hunerê, her pêt û zexm bûye. Digel vê çendê, tevî reng û motîfên medeniyeta Îslamî ya Sunnî, reng û bêhna baweriya Êzdatî, Yarsanî û Elewîtiyê jî ketiye nava vê beşa hunerî ya dengbêjiyê.

Dengbêjî ku di canda neteweyî ya Kurdan bûye arşiv ji bîra dirok û kana hunera vegotinê re, weke tradîsyonekê/kevneşopiyekê, hêza hunera zimanê Kurdî (Kurmancî) di asta bilind de girtiye. Çeşnên edebiyata devkî yên mîna efsane, destan, çîrokên gelêrî, hikayeyên gel, kilamên şeran, kilamên evînê û kilamên zarokan/lorî, bi xêra dengbêj, destanbêj û çîrokbêjan nîş bi nîş hatine neqilkirin û gihîştine ber pênu sê.

1. Armanç û Mijar:

Muzîka kurdî di bingeha xwe de xwedî dewlemendiyeke mezin e. Di muzîka kurdî de stranbêj, muzîkjen û dengbêjan wezîfeyek girîng dane ser milê xwe. Bi sitranên xwe bûne berdevkên civaka xwe. Dengbêjên welêt jî ji bo hunera xwe xizmetek mezin daye bo civakê. Bi vê sedemê mijara vê xebatê naskirina dengbêjiyê û minaka Şakiro û hunera wî Baweriya me ev e ku xebatên bi vî rengî yên li ser jiyana sitranbêj û muzîkjenan ji bo vê qadê dê gelek bifêde bin.

2. Rê û Rêbaz

Di vê xebatê de, her wiha dê bê dîtîna ku dengbêjan çiqas tesîr li ser huner û berhemana kirine. Lewra gelek dengbêj di zarokatiya xwe de tunebûn dîtine, di ciwaniya xwe de koç kirin, belangazî û feqîrî dîtine. Ji bo vê yekê qedr û qîmeta dengbêjan pêwîst e ku bê te zanîn. Me jî jiyana dengbêjan ji aliyê hûnera van da lêkolînek kir. Li ser internetê da çî hatiye nivîsandin û hatiye gotin, çî pirtûk hatiye nivîsîn , tez hatiye çêkirin û sempozyûm hatiye kirin me şopand. Li gor van çavkanîyan de me ev xebat bi karani.

3. Girîngî:

Mebest ji vê xebatê ew e ku kêmasiyên derbarê hunera dengbêjan û derbarê hunera Şakiro de bibe xebateke berfireh û di nav xebatan de cî bigire. Bi vê xebatê dê bê dîtîna ku dengbêj bi derûnî û giyanêke çawa stran gotine. Jiyan û hunera wan nasbûna wan Herweha hizin û zehmetiya ku kişandine bi vê xebatê dê derkeve holê. Xwendevan kêzêde dê derbarê dengbêjan de dê bibin xwedî agahî. Bi vê xebatê jî dê minaka Şakiro û hunera wî bê te nivîsî.

4. Sînor û Astengî:

Di vê xebatê de hûnera dengbêjiyê bi kurtayî hate lêkolînkirin. Ji ber ku hunera dengbêjiyê li heremekî gelek fireh hatiye bikaranîn. Her dengbêjek li herema

xwe yan ji li bajar û gundê xwe tê naskirin. Lê ji wan pir hindik tên naskirin navdar dibin. Li her gundekî yan jî taxekî dengbêjek heye. Şakiro ji ber ku jiyana xwe ji dest daye me nikari bu pê ra hevpeyvekî bikin. Lê ji ber ku gelek navdar e, gelek xebat li ser wi hatê çekirin. Me ji li gor van berhem gotar û pirtûkan lêkolîn kirin.

BEŞA YEKEM

PÊNESEYA KEVNEŞOPÎYA DENG BÊJÎYÊ

1.1. Pênaseya Dengbêjîyê:

Kelimeya "dengbêj" ku ji hêla avasaziyê ve bêjeyeke hevedu-danî ye, ji peyvika "deng" ku îsm e û ji ji peyvika "bêj-" ku lêker pêk tê. Lêkera "bêj-", di rewşa raweya fermanî de ye û di peyvika "dengbêjî yê de ji bo dariştina peyveke hevedudanî, weke hêmana duyem bûye xwedî peywir. Lewre mirov dikare bêjeyên dî yên mîna "çîrokbêj, destanbêj û qewlbêj" jî bide kêleka wê. Li ser vê di hêla vê hunerê de ev bêje, ji bo kesên ku van cûreyan dibêjin hatiye gotin.

Kevneşopiya "dengbêjî"yê nîşana edebiyata gel a anonim e. Dengbêjan, digel kilamên xwe, çeşnên dî yên mîna çîrok, efsane û destanan, di odeyên mîr û begên Kurdan de, li serê caxî û civatan pêşkêş kirine, pê re jî wan ev huner gurr û geş kiriye û bi vî awayî "edebiyata devkiî" ya Kurdî (Kurmançî), di nav edebiyata cîhanê de ciyê xwe girtiye.

1.2. Pênaseya Kilaman

Peyvika "kilam", di hin ferhengan de bi awayê "kilam" hatiye nivîsîn û wateya wê, bi stran û goranî hatiye dayin." (Demirhan, 2006: rr). Di hin ferhengan de bi awayê "kilam" hatiye nivîsîn û li ber wê, wateya wê bi Kirmanckî, "deyre" bi Tirkî jî "şarkî" hatiye diyarkirin. (Weroj, 2003) Li gor ferhenga Koma Vate, peyvika "türkü" tê wateya "deyîre" (M.Uzun, 2009). Di Kirmanckî/Dimilkî de li ser vê bêjeyê, biwêjek jî bi vî awayî heye: "deyire eştiş ser" ango ser o deyîre/kilame vatiş, ser o deyîre vetis, (Lezgin, 2005) ango li serê kilam derxistin. Di ferhenga Farqînî de li hember wateya "türkü" "kilam, stran û goranî" hatiye dayin.

Me li ser senifandina van berhemên edebiyata Kurdî ya devkî, ev rayişên jêr, li ber çavan girtine: Taybetiyên wan ên teşeyî, yên şihêrê ne û ji bend û teşeyê nezmî

pêk hatiye. Hêmanên wanên naverokî, mijar û temaya wan e; hêmanên wanên ahengî, kêş, pergala qafiyeyê, redîfû wezn e. Ziman, şêwaz û xweseriya dengbêj û hunerên edebî yên peyvû gotinên wan jî hene.

Bi ser van agahiyan de jî me tiroş kir ku aliyê antolojîkê van kilam, lawij û stranan jî derxin holê. Ji bo vê yekê, çavkaniyên şexsî yên mîna Ahmet Aras, Salihê Qubînî, Dengbêj Zahiro, Eliyê Bilûrvan, Dengbêj Muhemedê Xato, Heyderê Mûşî û dîrokzan Keleş Temo bi destê me ketin. Tevî van, bû nesîb ku em ji çavkaniyên nivîskî jî mifa bigirin. Lê dîsa jî aliyê mêjûyî yê van berheman qelsû kêma.

Edebiyata Kurdî ya devkî, bi gotina gotinbêj û gotinpêjê nola Yaşar Kemal, zaf zengin e. Heyfû mixabiniyeke mezin e ku têra xwe, nehatiye lêkolînê. Digel ku vekolerê zargotina Kurdî (Kurmancî), Celîlê Celîl, Ahmet Aras, Salihê Kevirbirî û gelekên di berê çila, fanos û fenera xwe dane vê hêlê jî, hîna dilê vî şaxê edebiyata Kurdî pêhênik nebûye û derdê wê hêdî nebûye.

BEŞA DUYEM

CÛREYÊN EDEBİYATA DENG BÊJÎYÊ

2.1. Edebiyata Gel a Anonîm

Edebiyata gel ku di nav xwe de dabeşî sê şaxên mîna edebiyata gel a anonîm/gelêrî, edebiyata gel a dengbêjan û edebiyata gel a ehlê medrese û tekiyayan dibe, digel dab û nerîta dengbêjiyê Şax û guli daye. Edebiyata gel a anonîm a Kurdî (Kurmancî) bi du awayan/te şeyan şax daye: Berhemên menzûm/helbestkî ku kilam û cûreyên dî yên mîna mani/dilok, lawij/zêmar, çîvanok û lorîkan in. Berhemên mensûr/pexşan ên mîna çîrok, destan, efsane, gotinên pêşyan, biwêj, şanoyên kevneşopî yên gelêrî ne.

2.2. Edebiyata Gel a Dengbêjan

Edebiyata gelêrî ya dengbêjan, di van waran de shax vedaye: Helbestên ser pesindariyê, helbestên ser kevirkirinê/niçandinê, kilamên dilikan û kilamên epîk.

2.3. Edebiyata Gel a Medrese û Tekiyayan

Gava em tînin ser edebiyata gel a medrese û tekiyayan, em dibînin ku bi du teşeyan ketiye geşedana xwe ya dîrokî: Berhemên menzûmên wekî îlahî, munacat, tewhîd/kelam, nezih, mewlûd û mersiyeyan-meqtelan. Berhemên mensûr/pexşan-menzûmên mîna xezawetname, cengname û menqibnameyan.

2.4. Taybetiyên Kilamên Dengbêjan

2.4.1. Taybetiyên Teşeyî yên Kilaman

Kilamên degbêjan, bi piranî xwedî hin formû teşeyên hunerîne. Yekeyên nezmî yên kilaman, carinan ji pênc, an ji şeş rêzan, carinan jî ji zêdetir rêzan pêk tînin. Ji ber vê bêistiqrariya hejmara komên rêzan, dabeşkirina wan li cûreyên edebî zehmet dibe.

Yekcaran, dirûvê hin bendên kilaman, daye metnên pexşanî jî, ango meriv dibêje qey metin, êdî ji teşeyê helbestkî derketiye; ketiyedelavê metnekî mensûr. Ji ber vê egerê, me divê ku teşeyê van cûre kilaman, weke "helbestên teşeserbest" dênin.

Kilam ku cûreyekî edebî û teşeyekî nezmî yê edebiyata gelêrî ya Kurdî-Kurmancî ye, anonîm e û di nav piraniya bendên wan de neqeret/dîsgotin jî heye. Mirov dikare kilaman jî, ji kevintirîn cûreyê helbesta gelêrî bihesibîne. Hêmanên ahengî yên kilaman, bi rêya wezin, qafiye û redîfê pêk tê. Cûreyê wezina kilaman, bi giştî li ser bingeha "wezna kîteyî" ye; bes çî heye ku qalibên wanên weznî, ne wisa bi rêk û pêk e. Hejmara kîteyên rêzikan carinan di navbera 8 û 11 an de guhere carinan jî zêdetir dibe.

2.4.2. Taybetîyên Naverokî yên kilaman

Piraniya kilamên dengbêjan, ji aliyê mijarê ve epik in. Digel ku di nav kilaman de wek cûreyekî edebî, kilamên dilikan, zêmar/lawje û sratnên dawetê/govendê jî hene; lê giraniya kilamên dengbêjên navdarên mîna Evdalê Zeynikê, Karapêt, Reso û Şakir, li ser bingeha kilamên mêrxasiyê ye.

Mijarên dirokî yên civakî û neteweyî, di nav hev de cî digrin. Hin kilamên şeran, li ser wan rûdanan in ku di navbera civaka Kurd bi xwe de qewimîne; hinek jê, li ser wan qewimînan in ku di navbera qareman û lehengên navdarên serokeşîr, şêxên terîqetan û giregirên bajaran de qewimîne. Piraniya kilamên dengbêjan, wê qaremaniya binavûnîşan a xweşmêrên ku li hember desthilatdarên demê, bi egîfî li ber xwe daye aniye/tîne zimên.

2.4.3 Têkilîyên kilaman bi Cûreyên Edebî re

Çeşnê destanê, hilberîneke edebiyata devkî ye. Bûyerên girîngên ku di jiyana gelan de qewimîne, lêbelê nehatine nivîsandin, bi rêya destanan ji wendabûnê rizgar

bûne. Ev bûyerên girîng jî bûyerine awarte ne. Bûyer bi xwe ne awarte be jî, gava ji devê destanbêjan hatiye vegotin, motîfên awarte lê hatine zêdekirin. Hin lehengên dîrokî, di van destanan de bûne awarte û weke lehengên destanî deriketine pêş. Di tarîxa gelan de ev bûyerên girîng, bi derbasbûna sedan salan, guherîne, nepenî bûne û teşeyên nû girtine." (ADAK, 2013)

Destan ku tê wateya helbest û hikayeyên epîk, weke cûreyekî edebiyata devkî hatiye qebûlkirin. Ji aliyê çeşnê edebî ve sê cûre destan hene: Ji bo helbestên ku bûyerên derbareyê xwedawend û gernasên berî dîrokê ji xwe re kirine mijar tê gotin. Ji bo helbesta gelêrî ya qehremaniyê ku pîvana wê 11 kîteyî ye tê gotin. Ji bo helbesta dirêj a qehremaniyê ku ji aliyê teşe û naverokê ve ji destangerdişî cuda ye tê gotin." (Farqini, 2000)

Peyvika destan, bi eslê xwe ji zimanê Farisî ye û di nav cûreyên bêjeyan de kelîmeyeke navdêr e. Ji hikâye û qisseyan re jî destan tê gotin. Wiha bi Frensî, ji destanê re "épopé" tê gotin. Wekî dî, leqeba bavê Rûstem jî "destan" e. Dîsa ji bo çîrok û navdariyê jî destan hatiye gotin. (Devellioğlu, 2012) Di edebiyata Erebi de navê destanan bi awayê "Siyeru'l-Ebtal" hatiye danîn, ango dîroka betlan, hogaçan, egîtan. Dîsa di Erebi de destan, bi navê "esatîr" ango çîrok û "xurafe" jî hatiye pênasekirin. (Sarı, İstanbul) Li gor edebiyata Erebi ya modern, navê destanan, "milhemi" ye jî.

Piraniya destanên Kurdî, bi xêra kevneşopî û çanda dengbêjiyê di nav civatê de jiyane. Destana Mala Zalê, Destana Kawayê Hesinkar, Destana Kerrû Kulik, Destana Şemikê Bêdiran, Destana Huseynê Kurdî Şah, Destana Dewrêşê Evdî, Destana Zerife Xanim û Elîşêr û Destanan Kela Dimdimê, ev berhemên qedirgiran gişt bi saya serê devê dengbêjan hatine heta roja iro.

Hin berhemên edebiyata devkî hene ku ji aliyê edîbên edebiyata nivîskî ve, ji ber hozanên dengbêj û hikâyebêjên edebiyata devkî hatine girtin û bi formata edebiyata nivîskî, ji nû ve hatine nivîsîn. Destana Kela Dimdimê yek ji van berheman e ku hem di edebiyata devkî ya Kurmancî de heye, hem jî ji aliyê Feqiyê Teyran ve hatiye nivîsîn. (Teyran, 2011 r.283)

Têkiliya Kilaman bi Hikayeyên gel, ew cûre metnên edebî ne ku hin bûyer û mace- rayên rastîn û xeyalî, bi şêwazeke xusûsî, ji nû ve bi awayê nesrî/ pexşanî têne nivîsîn. (Milliyet, 1991) Em dibin ku edebiyata devkî ya kurdî îro ev weke "destan" têne binavkirin Bi qenaeta me ev, ne rast e. Çünkî nabe ku seruwenên evîne weke destan bêne navkirin. Ev xeletî folklornasên navdar Pertev Naili Boratav sererast kiriye. Li gor wî, hikayeyên gel, bi van taybetiyên xwe ji çeşnê destanan cihê dibin: Hikayeyên gelî bi awayekî qet'î, ne li ser bingeha bûyereke rastîn ava dibin. Hikayeyên gel de teşe, nezm û nesr, digel hev e; bi derbasbûna demê re, nesr li ser nezmê girantir dibe. Vegoterê hikayeyên gelî, bi helwesteke rasteqînî bûyer û lehengan vedibêje. Di hikayeyên gel de ji qaremaniyê zêdetir, macerayên evîne cî digirin.

Di edebiyata medreseyan a nivîskî de, "çeşnê edebî yê mesnewiyan" şuna "hikayeyên gel" girtiye. Siyahpoş ku Seyful Milûk û Bedû'l Cemal nivîsiye¹³ û Siwadî ku Leyla û Mecnûn nivîsiye, linivîsiye, li ser vê kevneşopiyê çûne. Feqiyê Teyran û Mela Huseynê Bateyî, efsaneya bi navê Zembîlfiroş ku di edebiyata devkî ya Kurdî de warê nivîskî. Yek jê, hikayeya Mem û Zînê ye. Ehme-dê Xanî, ev ji edebiyata devkê girtiye û bi awayê edebiyata dîwanê nivîsiye. Îca di vê berhema xwe de, ew bi xwe di beytekê de diyardeke ku "efsane" ye:

Şerha xemê dil bikem fesane

Zînê û Memê bikem behane

Nexmê wê ji perdeyê derînim

Zînê û Memê ji nû ve vejînim (Şemrexî, 2010)

Hema hema hemû hikayeyên gelî yê evîne ku bi Kurdî-Kurmancî têne vegotin, pexşan û nezm digel hev e. Di van metnan de cîyên ku menzûm in, bi awayê kilamkî, bi newayî tên gotin. Hikayebêjên ku van berheman di huzura guhdaran de, şevên şevbihêrkan dibêjin, hêza hunera xwe ya dengbêjiyê jî nîşan didin. Hikayeyên gelîyên mîna Mem û Zîn, Siehmedê Silivî û Xecê, (H.Akyol, 2000) Binefşa Narîn, Sti û Fexri, Senem Xanim, Tahir û Zahir, Gulnaz Xanim û Melo û gelekên dî, (H.Akyol, 2000) gişt bi tevî ku pexşanî ne, di nav metnên wan de, her menên nezmî hene û ew der, bi kilamkî têne stran. Hikayeya Mem û Zînê ku ji aliyê Dengbêj Zahiro ve bi navê Memê

Alan tê stran, hema hema hemû bi kilamkî ye û ji aliyê dengbêjên navdar ve di nav gel de hatiye gotin û hîna jî di bandan de, li be destê me heye.

Têkiliya Kilaman bi "Çîrokên Gelêrî" re Vegoterên rastînên edebiyata devkî ya Kurdî (Kurmancî) ku "dengbêj" in, bi deng, jest û mimîkên xwe, ew berhemên pexşanî ku "çîrokên gelêrî" ne ji devê dapîr û bapîrên hozan girtine, ew ji dev kirine û neqlî nifşên serdema xwe kirine. (Weroj, 2003) Çîrokên mîna Mirze Mihemedû Kose Úsiv ku di edebiyata devkî ya Kurdan de tîpên alegorîk in, bi vî awayî nifş bi nifş hatine heta roja me. Piraniya çîrokên gelêrî yê Kurdî-Kurmancî, mîna metnên destanan, digel metnê pexşanî, metnê nezmî jî heye û çîrokbêj, van ciyên nezmî, bi mekneke newayî, mîna kilamên dengbêjan distrên. Wekî mînak, çîroka gelêrî ya bi navê Fatima Salih Axa, Bedran û Huzna, Reşît Paşa û Xezalês Huso û Nazê û gelekên dî.

Peyvika "zêmar" di çanda edebî ya Kurdan de, xwedî çend wate û îfadeyên cihêrengî ye. Li hin herêman, li herêma Xerzan- navê kilamên ku li ser mirin, an jî kuştina yekî tî stran, "gerandin" e, li hin herêman jî navê van cûre kilaman "lawij" e, di Kirmanckî de jî ji zêmaran re "lorandin" 24 yaşında. Wateya ferhengî û terîmî ya zêmaran, wiha jî hatiye pênasekirin: 1. "Mersiye, lawika miriyan, Giri, girîna diya bûkê (gava ku keça wê derdixin û bi girîn li serê kilam dibêje). (Farqini, 2000) Ji wan helbestên ku li ser karesatan e û ji wan stranên ku bi şewat in re jî zêmar tî gotin. Zêmar, ji wê kilama gelêrî re tî gotin ku bi piranî, di pey mirina yekî de, yan jî piştî bûyereke êşdar û xemgîner tî stran. Zêmar, wanhestên mirovên mîna tirs, kelecana, xemgîni û xweranegirtinê ku li hember neçariyên mîna afatên siruştî, nexweşin û mirinê der dibin, tîne zimên. Di çanda Erebi de, wateya zêmarê, gelek nêzî van pênaseyên jor e. Di cand û edebiyata gelêrî ya Ereban de ji zêmarê re dibêjin "hejmartin û bibîranîna başî û qencyên kesê/kesa mirî". (Sarı, İstanbul)

Di edebiyata klasîk de ji helbestên zêmarî re "mersiye" tîgotin û nivîskarê wan diyar e; bes nivîskarên zêmarên edebiyata gelêrî, ne diyar in, lewre weke berhemên anonîm hatine binavkirin.

Çawa ku di "edebiyata nivîskî ya berê" de hejmara ber hemen mersiyeji gelek zêde ye, di edebiyata devkî/gelêrîya Kurdî de jî gelek zêde kilamên şîne, ango zêmar hene Heta mirov dikare bawer bike ku kana kilamên Kurmancî, ji sedî 50 berhemên

zêmarî ne. Têkiliya zêmaran bi kilam û destanan re zêde heye. Digel ku hin zêmar ji aliyê dengbêjên mêr ve hatine gotin jî, bes di kultura Kurdan a civakî de piraniya zêmarbêjan, pîrekên navsere bixwe ne.

Kilamên bi navê Bavê Becet Şêxê Kubar, Mîr Beg ku Şakir distre wek mînakên mezinê zêmarê ne ku di warê dengbêjiyê de wan û deng daye. Wekî dî, kilamên bi navê Kekê Xiyasedîn, Şêx Fexri Şêx Zahir, Seyidxanê Kerr, Ferzende, Xalid Begê Cîbrî û Kerem Qolaxasî ku Dengbêj Şakir wan distrê gişt ji çanda zêmaran in, ku ji çanda dengbêjiyê re bûne çavkaniyên girîng.

Têkiliya Kilaman bi "Loriyan" re Di jiyane de dengê ewil ku tehma kilam û muzîkê dixwe guhê mirovan, helbet "lorî" ne. Dayik, çawa ku şîrê xwe yê şîrîn ji bo mezinbûna bedenê dide bebikê/a xwe, wisa jî bi wan loriyên xwe yê newadar, hewl dide ku bi xêra şîretên loriyan, sebiyê xwe, ji aliyê derûnî ve jî bigihîne. Bi xêra wan melodyên ku dayik bi loriyan di guhê sebiyan de dikin lûrelûr, sebî hînê ahenga huner û muzîkê jî bibin.

Lorî ku di edebiyata Kurdî ya devkî de weke kilamên zarokan tên binavkirin, ji hêla wateya xwe ya têgehî, cûreyî edebî, newa, taybetiyên teşeyî yê yekeya nezmî û hêmanên xwe yê ahengî ve, hêleke têr û tije ya lêkolînê ye. Hinek kilamên dengbêjan hene ku bi temamî ji "lorî"yên dayikan rasterast hatine girtin û li nav gel berbelavî bûne. Kilama Teyar Begê Qereçolî û Mihemed Begê Metînî ji vê re mînaekeke navdar e.

Cûreyê loriyan, çawa ku di edebiyata Kurdî ya anonîm de xwedî cîyekî giran û girîng e, di edebiyata gelêrî ya piraniya neteweyên cîhanê de jî xwedî giraniyeke mezin e. Di çanda her gelekî de awayê strana loriyan û teşeyên wanên edebî-hunerî, gelenek zêde dişibin hevûdu. Ji hêla felsefeya xwe ya îcrakirinê ve çeşnê loriyan, cûreyekî edebî yê gerdûnî ye ku hema hema hemû mirovahiyê eleqedar dike.

Têkiliya Kilaman bi "Lîstikên Zarokan" re Listik ku ji bo gihîştina zarokan gelek girîng in, di canda Kurdan de xwedan taybetiyên muzîkehî ne jî. Piraniya lîstikên zarokan, bi tevi nermegotinên newadar tên lîstin. Di her merheleyeke temenê zarokan

deawayekî lîstikê heye û ev lîstik, bi gotinên ahengdar in. Çawa ku zarok bi lorîyên dayikan têne terbiyekirin, bi gotinên çivanokî bi behra wanê axaftin û diksiyon e tê pîrxulandin. Minak gava bapîr an jî dapîr, bi destê sebiyê ku êdî hindik maye bi ser piyan bikeve û bipeyive digire, jê re bi awayekî newayî wiha dibêje:

Ho kani ho kani

Ho panî ho panî

Keziya reşa panî

Avêtin golanî

Gola me bi qamîş e

Mara fişefiş e

Kekê min çawiş e

Çawişê piçûk e

Min jê ra anî bûk e

Bûka Hesên Begê

Danî ser kulengê

Çûme mala xalê xwe

Xalê min rakir gopalê xwe

Çû nava heywanê xwe

Heywanek serjê kir

Danî ber mêvanê xwe

Mêvanê xwe verê ki

BEŞA SÊYEM

JÎYANA DENG BÊJ ŞAKIRO

3.1. Jînenîgariya Şakiro

Dengbêj Şakiro, ji welatê Serhedê ye. Şakir ji xelkê Agirî, ji Patnosê ye. Xelkê Gilxê ye. Mala wî, serê ewil li Qereyaziyê bûye. Ji wê derê wan ew anî hatin Enqerayê. Li wê derê mal lê mîrat kirin. Xwediyê sozê xwe derneketin. Ji wê derê rabû hate Îzmirê.

Li gor agahiyên rojnameya "Ronahi"yê ew, ji gundê Dutaxê ye. Bi navê din, ji Badoyê ye. Peyre hê di zarokatiya wî de, mala wan diçe Kela Elajgirê. Çend salan piştê careke din vedigerin Cemalwêrdiyê (gundê Dutaxê). (Aras, 2015)

Malbata wî û hatîna wî ya dunyayê Li hêla Serhedê, ji Dengbêj Şakiro re, "Şakirê Bedîhê Mihê Zîllî" dibêjin. Şakirê Bedîh, di sala 1935an de, li Badoyê (gundê Dutaxê) hatiye dinê. Bi eslê xwe ji eşîra Ziliyan e. Hin kes dibêjin ku Bekirî ye. Li gor Dengbêj Zahiro, ew ne Bekirî ye; xelkê Gilxê ye. Jixwe beşek ji binemaliya Ziliyan li Serhedê; beşek jê jî li herêma Xerzaniyê ne. Li nav gelê herêmê, ji van ên herêma Xerzan "Gawestiyayî"; ji beşa ku derbasi Serhedê bûne re "Rawestiyayî" tête gotin. Malbata Dengbêj Şakiro duwazde caran mal bar kirine. Ciyê xwe guherandine,

Em ji agahiyên Ronahiyê tê digehîjin ku zarokatiya dengbêjê me, li gundê Dutaxê bihuriye. Aliyê perwerdehiya Dengbêj Şakiro, hêjayî lêhûrniherînê ye. Li gundê ku mezin dibe, li Cemalwêrdiyê, şagirtê dengbêjê navdar Evdalê Zeynikê hebûye. Navê wî, Bedîhê Kor e, bi navê din, "Bedîhê Hemîd". Ev dengbêj bi navê deng bûye. Dengbêj Şakir, dibe şagirtê vî dengbêjî. Li cem Dengbêj Bedîhê Kor dest bi dengbêjiyê dike. Digel ku Dengbêj Zahir, wî mîna, rênçberêkî bêxwendin diyar dike jî, diyar e ku di nav kêş û hewayê zana û xuyaniyên civat û caxiyên de bûye xwedî tecrube û huneriyê. Ji aliyê hunermendiya wî ve cîhana dengbêjiyê ya welatê Serhedê jî pîvan e. Gelek berhemên wî, ji Evdalê Zeynikê ne. Jixwe em ji agahiyên derbarê Evdalê Zeynikê têdigehîjin; ku kana kilaman Evdêl e. Dengbêjên Serhedê, belkî

dengbêjên herêma Xerzaniyê, Heranê jî dîsa berhemên wî strane. Li gor Dengbêj Salihê Qubînî, Dengbêj Mistoyê Heyran, dengbêjekî pey Evdêl e. Ev dengbêj mamosteyê Dengbêj Reso ye. Dîsa Dengbêj Sedîqê Diborî jî hevdemekî van dengbêjan e.

3.2. Jîyana Hûnerî ya Şakiro

Di dema dengbêjiyê de, dilê Şakir dikeve keçeke cîranê wan. Navê qîzîkê Esmer bûye. Wan keçik jê re xwestiye; lêbelê bavê keçikê ew nedaye. Ji ber ku ew û bavê Şakiroyî neyarê hev in, keçikê didin yekî din. Şakiro jî dibe bengiyê vê keçikê û kilam davêje ser xwe û wê:

"Lê lê Esmer heyra minê te xêr nedi

Di kaviê gunda da ji te, ji xwe, axe lo ji wî dili

Xwedê Rebi bejna Esmera Şukri

Binbaşiya qizan û bûka

Fenani rihanê di wargê Mala Ereb Axa da

Bi gulê û sosinê bi piltanê ra dew didit û lê dixemili (Aras, 2015)

Şakir, heyama ku dibe 15-16 salî, bavê wî malê bar dike, diçe Toraqan. Gundê Milazgirê. Wê hingê Şakir bi Dengbêj Ferzê re hevnas dibe. Şêwaza stranên xwe dixê ser şêwaza vi dengbêjî. Dengbêj Ferzê, şagirtê Evdilkerîmê Kuştîya bûye. Evdilkerîm hevdemê Evdalê Zeynikê bûye. Di bin bandora şêwaza Dengbêj Evdalê Zeynikê de mabûye. Di pey guherandina gelek ciyan de, mala Dengbêj Şakiro, tê bajarê Îzmîrê. Li vê derê bi cî dibe. Ciyên ku mala Dengbêj Şakiro lê geriyaye û lê maye ev in: Bado/Dutax, Elajgir/Cemalwêrdî, Toraqa/Milazgir, Reşayê Sebrî/Qereyazî, Govendik/Xinûs, Çixirxan/Qereyazî, Gazbêl/Qereyazî, li nav Qereyaziyê, Edeneyê, Mûşê û careke din li Qereyaziyê û dawiyê li bajarê Îzmîrê. Şakir li pir ciyan geriyaye. Şakir hatiye Mûşê, Edenê, Qerekilîsê, peyre çûye Patnosê, ji wê cardin fetiliye hatiye Qereyaziyê, ji Qereyaziyê hatiye Enqerê. Ji Enqerê hatiye Îzmîrê, li wê derê rehmet

kiriye. Mala wî li Qereazyê bû. Xelqê ew xapandin anîn hatin Enqerê. Li Enqerê wan ew perîşan kir. Xweyî sozê xwe derneketin, Ji wê derê rabû hate Îzmîrê. (Zahir)

Hema çî jî bê gotin, xebata vi hunermendê hêja, rewşa wî ya li xerîbî û xurbetê, zipîzelal diyar dike, bê ka çî karû bar kiriye. Bê guman gotina wî ya berî mirinê ku di pêşgotina bandan de derketi bû, têra xwe rewşa wî ya debariyê dide xuyakirin: "Aşiq Weyselekî miletê Tirk hebû, piri wan ew mezin kir û danî serê xwe, édi nizanibûn çî bikirana; lêbelê em li van deran wiha bêkes mane." Di jiyana xwe de kar û barê wî, bi piranî dengbêjî bû.

Çavkaniya me ya resen a li ser rewista wî, berhemên wî ne. Em ji gotin, rêz û helbestên wî tê digihîjin ku camêro, dilekî xwe yî bengî hebûye. Haya wî ji rûdanên nav gelê wî hebûye. Kilamên wî yên ser dilan, hestiyariya wî, dilê wî yê ku ketiye bin çanda gelê Kurd, bi awayekî zipîzelal rayî dide. Li ser wan lehengên Kurd ku serê xwe di rêya vîna gel de dane, ji dil û can distrê. Di hinek kilamên xwe de, dema ku lawîja/zêmara ser van kesan dibêje, mirov dibêje qey ku bi tehereke kilamane rasterast digirî, dizare û dike fixan û fîzar. Li gor ku hevalê wî Dengbêj Zahir diyar dike, ew bi xwe pir dilovan bû.

Bêguman gelek kilamên ku hatine guhê dengbêjhezan, ji kana hunera wî nizilîne. Bi gotina pîr û navsereyan "li welatê Serhedê", li welatên/hêlên dinên Kurmancan, çî dengbêjî dengbêjî kiribe, helbet sûde ji berhemên wî wergirtiye. Dengbêj Şakiroyê Bedîh, kedeke mezin daye edebiyata devkî ya Kurdî. Eger em mîrateya Dengbêj Evdalê Zeynikê û Dengbêj Reso daynin aliyekî, dîsa hunera Dengbêj Şakiroyê Bedîh, nola çiyayekî bilid ku xwe dide rû çiyayên mezin dixuye. Eger em bi çavê dengbêjiyê lê binihêrin, camêro dengbêj e.

Dîsa heke em bi çavê şairiyê lê mêze bikin, mêriko şair e. Her çendî kana wî ya hunermendiyê digihîje şairê efsanewî Dengbêj Evdalê Zeynikê û Reso jî, dibe ku em şairiyeke wî ye xweser qebûl bikin. Vî ciwanmêrî, gelek helbestên ferdî, civakî û gelêrî ku tenê devkî bûne, bi nefesa xwe, tomarî bandan kiriye, li malan heta derengê şevê straye. Bûye pireke antolojîk bo edebiyata devkî. Ristû rola wî ne weke ya Dengbêj Reso ye.

Ciqas dengbêjê welêt hene, hema hema bala wan giştan çûye ser xax û hunerê vî dengbêjî. Berhemên ku ji nav dilê wî yê bengî diza û di qirik û gewriya wî de derdiket, dihat guhê xelkê, dibû mayen- de di hiş û mêjiyan de. Di heman demê de jî dibû amûr bo strana dengbêjên dî. Dîsa dengbêjekî ku şagirtê vî dengbêjê me ye, em pêhisiyan ku Şakiroyê Piçûk e.

Mirina wi di pey koçkirina xwe ya bajarê Îzmîrê de, Dengbêj Şakiro, ji gurçika xwe nexweş ketiye, êdî baş nebûye û sala 1996an koça xwe ya dawî kiriye. Li xerîbî û xerîbîstanê.

Navû dengê Şakiroyê Bedih, belavî tamamê welêt bûye. Çiqas dengbêjên vî welatî hene, hemû bi navû dengê wî hesiyane. Haya giştan heye ji huner, xweserî û hilberîvaniya wî. Gelê herêma Serhe- dê çawan bi kilamên wî radibûn û rûdiniştin wisa jî, herêma Xerzan, Botan û Torê jî bi dilekî xweş lê guhdarî dikir. Her çiqas radyoyan dengê vî dengbêjî ranedigihand guhdaran, bi derketina teyiban re, kesê xwedî derfet, sirf ji bona dengê wî, teyib amade dikirin, kar û barê xwe dikirin, ji mala xwe radibûn, rast berê xwe didan mala wi.

Dihatin li mala wî rûdiniştin, bi hurmeteke mezin, teyiba xwe datanîn, daxwaza kilaman jê dikirin. Wî jî qet danepaşî nedikir, xwesteka wan, heta jê bihata, bi dilekî xweş dianî cî û dest bi stranê dikir. Bandê wan, digel ezimandina mêvandariya birûmet, dadigirt û ew qaîl dikirin. Carcaran ev kesên ku bona vî awayî dihatin, li mala wî bi serî li hev diqelibîn û mala wî dibû studyo.

Li nav gel, bi dehan bandên Dengbêj Şakir hene ku li malan hatine dagirtin. Mijara me, di bin vê serbeşê de ew kilamên şeran in ku sosyolojîk in. Ji ber vê egerê, em dê bal û dêhna xwe nedin ser wan kilaman ku li ser dilan in. Piştî lêkolînan em pê serwext bûn ku pirniya kilamên ku Dengbêj Şakir wan distrê, ne kilamên wî bi xwe ne; bes wî ji dengbêjênbinavûdengên welêt girtineû strane. Kana kilamên ew distrê, Evdele, digel vê yekê, wî kilamên Dengbêjên Serhedê, kilamên dengbêjên herêma Xerzaniyê, herêma Heranê strane.

Dengbêj Salihê Qubînî, Dengbêj Şakir, kilamên Dengbêj Mistê Xelê Heyran ku dengbêjekî pey Evdêl e û mamosteyê Dengbêj Reso ye jî gotine. Dîsa Şakir, kilamên

Dengbêj Sedîqê Kilama bi navê "Eman Eman Bişêriyê" jî, hem ew distrê, hem jî Karapêtê Xaço distrê. Diyar e ku Şakir, kilama bi navê "Şadê Mêrdînê", ji dengbêjên herêma Mêrdînê girtiye û straye.

Dengbêj Salihê Qubînî hîn bûn ku berhema/kilama bi navê "Emînê Ehmed" ji aliyê dengbêjekî aliyê Qubînê ve hatiye hilberî n. Navê wî jî Elîkê Mamed e. Li gor texmînan ev dengbêjê "navwenda", bi xwe Êzîdî ye. Dengbêj, kilama bi navê "Kekê Xiyasedîn" ji Dengbêj Reso girtiye; çunkî Reso berî Şakir eû di bandên Reso de hîna jî ev kilam heye. Kilama bi navê "Gulê Dêran" jî ne ya Dengbêj Şakir e. Dengbêj Salihê Qubînî dibêje ku min ev berhem berî 30 salî ji Dengbêj Keremê Milazgirî girtiye. Ji rehmetyê Şakiro zêdetir distrê. Jixwe Resoyê dengbêj jî vê kilamê dibêje. Kilama bi navê "Felek/Mala Paşê" Dengbêj Reso jî dibêje. Kilama bi navê "Mîr Beg" berî Şakirî, ji aliyê Dengbêj Resoyî ve jî hatiye stranê.

Di banda Reso de ku ji aliyê Çağdaş Müzikê ve hatiye belavkirin, ev berhem heye. Dengbêj Salihê Qubînî jî dibêje ku min ev kilam ji rehmetyê Keremê Milazgirî girtiye. Dengbêj Reso, kilama "Lo Miro" distrê ku evi nav wan kilaman de ye ku Şakir distrê.

Kilama navdar a bi navê "Bavê Becet Şêxê Kubar" ku berheme ke herêma Xerzaniyê-Amedê ye, ji aliyê Dengbêj Mihemedê Xato ve jî tê stran. "Şerê Yûnan û Bulxaran" jî kilameke Dengbêj Reso ye ku Şakir wê distrê. Kilama "Bişarê Çeto" ku behemeke herêma Xerzaniyê/Batmanê ye, ji aliyê Dengbêj Zahiro ve jî tê gotin û helbet Dengbêj Şakir ew ji dengbêjan girtiye û gotiye.

Kilama "Nûrê" ku berhemeke herêma Diyarbekîrê ye û Dengbêj Şakir wê dibêje, ji aliyê Dengbêj Kerapêtê Xaço ve jî tê gotin. Dibe ku hilberînerê vê kilamê, Dengbêj Sakotê Kor ê Fileh be. 92 Kilama bi navê "Emro" jî, kilama Dengbêj Reso ye û di banda wî de heye ku Dengbêj Şakir ew dibêje. Kilama bi navê "Wey Dil/Dêrsim e Xweş Dêrsim e" kilama Dengbêj Evdalê Zeynê ye.

Kilama bi navê "Dewerêşê Evdî" jî berheme ke hêla Heranê ye, gelek dengbêjên navdar, her yek bi newayekî, bi gotinine cihê distrên . Kazoyê Dengbêj, Salihê Qubînî, Zahiro jî cihê dibêjin ji Şakiroyê dengbêj. Dîsa me di xebateke hêja

Eyûb Kiran de dît ku dengbêjên herêma Siwêrekê bi awayekî din distrên. Kilama bi navê "Wayê Derdo" di pirtûka A. Aras de, bi navê "Hayê Li Min" hatiye qeydkirin û wî diyar kiriye ku ev kilam, ji aliyê Evdalê Zeynê ve hatiye derxistin. Kilama bi navê "Bavê Becet-Xêriya" ku Şakir distrê, kilameke anonîm e û nehat zanîn bê ka kê cara ewil ew derxistiye û straye. Lêbelê Dengbêj Sidîqê Bozo jî vê kilamê distrê.

Kilama bi navê "Bişarê Çeto" û "Emînê Ehmed" ku berhemeke herêma Xerzaniyê ye, ne ya Şakir bi xwe ye. Dengbêj Şakir, ev kilam ji Dengbêj Reso girtiye. Di bandê Dengbêj Sidîqê Bozo de ku ji alî Kenan Elektronîkê ve tête belavkirin û li ser bandê, navê dengbêj tenê bi qelema destan nivîsandiye, ev berhem heye. Tiştê ku heye ne mîna Şakiro vedibêje. Kilama bi navê "Heqîko" ku Şakir distrê, ne ya wî ye. Em di bandê Şerê Bişarê Seydo" de ku ji aliyê Çağdaş Muzîkê ve hatiye çapandin, rastî vê kilamê tên. Dengbêjê beni Reso ye. Serê pêşî wî ev berhem straye. Kilama "Wuskanê Bira" ne ya Şakir e, ya Dengbêj Reso ye ku ev di bandê Reso de heye. Kilama "Bavê Hedê Siwarê Kubî" jî ya Dengbêj Reso ye.

Kilama bi navê "Tahir Xan" jî berhema Evdalê Zeynê ye. Şahê Ecem, bi ser Serdarê Kurdan Tahir Xanê Qeleniyê vegirtiye û eşîra Celaliyan jî alîkariya Şahê Ecem kiriye, Tahir Xan têk çûye. Evdalê Zeynê jî, li ser vê ev kilam deraniye. Resoyê Gopalan jî ev kilam gotiye.

Kilama bi navê Lo Axawo (Mala Usivê Seydo) ku Şakir distrê, li gor çavkaniyan ji aliyê Dengbêj Siloyê Gulê ve hatiye derxistin. Dengbêjê ku kilama bi navê "Mihemedê Elî Begê Kekê Zahido Siwarê Tîran" deraniye, Evdalê Zeynê ye. Dengbêj Şeroyê Biro jî vê distrê.

Li gor A. Aras, navê vê kilamê "Haylê Metê" ye. Kilama bi navê "Lo Siwaro/Mala Dibo" berhemeke herêma Xerzaniyê ye, ji aliyê gelek dengbêjan ve tê stran. Ji bilî Şakiro, Qasimê Qubînî, Teyiboyê Misircî/Kurtelenaî, Huseynê Farî, Mehmûd Qizil, Zahiroyê Hingilosiyê Mûşî, Salihê Qubînî, Brahîmê Newrozî, her yek bi guhertoyekê dibêje. Çêkerê kilama bi navê "Dengbêj Ferzê", Ji bilî Şakiro, Dengbêj Zulkuf jî distrê, Kilama bi navê "Ferzende Beg", ji bilî Şakiro, ji aliyê dengbêjên di ve jî tê gotin. Dengbêj Ahmet Aliksan jî vê kilamê, bi awayekî cihêtir distrê

ENCAM

Di vê xebata ku li ser çand û hunera Dengbêjiyê me dît ku Dengbêji di nav gel da gelek giring û pêwis te. Dengbêji di jiyana mirov û ya gel de ciheke gel ki giring dikre. Bi deng û awazan, kilam û stranan jiyana û hunera gelê kurd dewlemend kiriye. Çirok destan hwd. bi xêra edebiyata devkî çê bu ye. Ji bo muzîka kurdî ji berhemên ku afirand di roja me ya îroyîn de jî bi hezkirin tên guhdarîkirin.

Çanda dengbêjiyê wek hemanke edebiyata gel û serkaniyeke dîroka kurdan ciyê xwe di nav çavkaniyên zindî girtiye. Çawa ku hêza hunerî ya hûnandina gotinê li ser milê dengbêjiyê zindî maye, wisa jî derbirîna edebî ya biaheng, digel "newa" û rîtma xwe ya siruştî pê jiyaye. Wekî cûreyekî edebî û teşeyekî nezmî yê edebiyata gelêrî ya Kurmancî kilam, çawa ku dengbêji ji kevintirîn cûreyê helbesta gelêrî tê hesibandin, bi qalib û wezna xwe, ne wisa bi rêk û pêk e. Piraniya kilamên dengbêjan ku ji aliyê mijarê ve yan lîrik, yan jî epîk in, zêmar/lawje û stranên dawetê/govendê jî di xwe de dihewînin. Giraniya kilamên dengbêjan, ji hêla mijarê ve li ser bingeha mêrxasiyê ye.


Çawa ku mijarên dîrokî yên civakî û neteweyî, tê de cih digrin, hin rûdanên ku di navbera qareman û lehengên navdarên serokeşîr, şêxên terîqetan û giregirên bajaran de qewimîne jî, ji kilaman re bûne mijar.

Têkiliya hunerî ya dengbêjiya Kurmancî, çawa ku bi cûreyên edebiyata gelêrî yên mîna destan, çîroka gelêrî, hikayeya gel, zêmar lorî û lîstikên zarokan re heye, di heman katê de bi cûreyên edebiyata dînî-tesewwufî yên mîna xezanname, îlahî, qesîde, mersiye û medhiyeyan re jî têkildar e. Digel van cûreyên dînî, peywendiya dengbêjiyê, bi şaxên zanistî, yên mîna dîrok, cografya, psîkolojî re jî heye.

ÇAVKANÎ

- Adak, A. (2013). *Destpêka Edebiyata Kurdi*. İstanbul: Nubihar.
- Aksoy, H. (2013). *Nazım Türleri*. Eskişehir: AÜAF .
- Aras, A. (2015). *Şakiro*. İstanbul: Ronahi.
- Demirhan, U. (2006). *Ferhenga Destî bi Kurdî* . İstanbul: Nûbihar.
- Devellioğlu, F. (2012). *Osmanlıca Türkçe Ansiklopedik Lügat* . Ankara: Aydın Kitabevi.
- Farqini, Z. (2000). *Büyük Türkçe Kürtçe Sözlük*. İstanbul: İstanbul Kürt Enstitüsü.
- H.Akyol. (2000). *Çirokên Kurdî*. İstanbul: İstanbul Kürt Enstitüsü.
- Lezgin, R. (2005). *Ferhengê İdyomê Kurdkî*. İstanbul: Vate.
- M.Uzun. (2009). *Ferhengê Kirmanckî*. İstanbul: Vate.
- Milliyet. (1991). *Edebiyat Ansiklopedisi*. İstanbul: Milliyet.
- R.Zilan-S.Roşan. (tarih yok). *Destanên Kurdî*. Stockholm: Stockholm Kürt Enstitüsü.
- Sarı, M. (İstanbul). *Qamusu Türki-Erebi*. 1991: Gonca Yayınevi.
- Şemrexî, H. (2010). *Ehmede Xani*. İstanbul: Nubihar.
- Teyran, F. (2011 r.283). *Jiyan, Berhem û Helbestên wî*. İstanbul: Nubihar.
- Weroj, S. (2003). *Ferheng*. İstanbul: War.
- Xeznedar, M. (2000). *Diwana Ciziri*. Duhok: Dicle.
- Zahir, D. (tarih yok). (A. Aras, Röportaj Yapan)

WÊNE





MALA DENGEBĒJAN- DĒYARBEKĒR